# Nûçe û kurte nûçe

## Pêşangeha Çiyayê Hunerî

**Di** roja 30 /9 / 2005-an de, bi vê navnîşanê ( **pêşangeha Çiyayê hunerî** ) di navenda rewşenbiriyê de , li bajarokê Cindirêsê , çiyayê Kurmênc (Efrînê) hatibû vekirin .Dora / 350 /kesî ji cemewerê Kurd lê beşdar bûn .

Di vê pêşangehê de / 90 ) hunermendên wêne , saz bi van renegên hunerî ( Teşkîlî- Nehit – Kerîketêr – Fotogiraf- Saz ). Di gel çend hunermendên Ereb (Se,id Yegen û Yeqûn Dulêmî..) tê de pêşkêş kirin .

Hêjayî gotinê ye ku, ev pêşangeh, sê rojan berdewame bû.

**********

## Kurd Û dadgeha Ewlekariyê

Dadgeha Ewlekariya Dewletê li Şamê pênc sal zindan ligel karên dijwar li siyasetvanê kurd Mehmud Elî Mihemed birîn. Siyasetvan Mehmud Elî Mihemed endamekî birêvebiriya Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Suriyê ye. Ew di 01.04.2005ê de hatibû girtin, piştî ku ji serdanekê li Kurdistana Iraqê vegeriya. Ew di 21.05.2005ê de serbest hatibû berdan û li hêviya dadgehkirina xwe mabû Û ji bo sedemên sivik, ceza wî kirin du sal û nîv. Û bilî wî jî dadgehê pênc sal zindan li du girtiyên Kurd Haşim Ehmed Ehmed û Şahîn Mihemed Husên birîn. Dadgehê herdu girtî bi "endametiya rêxistineke qedexe" û "hewildana perçekirina beşekî ji Sûriyê û girêdana wî bi welatekî biyanî ve" gunehkar kirin. Ev guneh ji bo hemî Kurdên ku, li pêşiya vê dadgehê beşdar dibin tên bikaranîn.

**********

## Rojiya Kevin

Fastîvalek bi navê **Rojiya kevin**, li bajarê Helebê li dar ket . Di 19/10/2005 an de, şevek taybet ji bo kevnetor û stirana Kurdî li dar ket. Di vê şevê de: 1-**Koma Kurdax** –Beşê reqsa zarokan . 2-**Koma Rojîn** ya reqsa gelêrî. Û hunermend 1-**Osman Can** 2- **Mihemed Welîd** 3- **Şêrîn**. Ev şev bi awaz û sema xemilandin.

Hêjayî gotinê ye ku, bîtirî 2000 mirov di vê şevê de beşdar bûn. Û li dawiyê, berpirsiyarên fastîvalê xelat li hemî endamên kom, hunermend û berpirsiyarên wan belav kirin.